

PAPER DETAILS

TITLE: HACÎ QADIRÊ KOYÎ: DAMEZIRÎNERÊ KANONA NETEWEYÎ YA KURDÎ

AUTHORS: Zülküf ERGÜN

PAGES: 111-126

ORIGINAL PDF URL: <https://dergipark.org.tr/tr/download/article-file/2171355>

HACÎ QADIRÊ KOYÎ: DAMEZIRÎNER Û KESÊ DUYEM Ê KANONA EDEBÎYATA NETEWEYÎ YA KURDÎ

Zülküf ERGÜN

Zanîngeha Mardin Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî li Tirkîyeyê Beşa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî,
zxweshevi@gmail.com, <https://orcid.org/0000-0001-8784-56-36>

Article Types / Makale Türü:

Research Article / Araştırma Makalesi

Received / Makale Geliş Tarihi: 02/01/2022

Accepted / Kabul Tarihi: 22/04/2022

<https://doi.org/10.26791/sarkiat.1052484>

HACÎ QADIRÊ KOYÎ: DAMEZIRÎNER Û KESÊ DUYEM Û KANONA EDEBÎYATA NETEWEYÎ YA KURDÎ

KURTE

Kanona edebîyata neteweyî yek ji xalêن pev-girêdana edebîyat û sîyasetê ye ku di serdemâ modern da ji bo nûnertîya nasnameya çandî ya neteweyekê hatîye dahênan. Di edebîyata kurdî da cara pêşî Hacî Qadirê Koyî bingeha kanona edebîyata neteweyî datîne û Xanî wek bavê vê kanonê û xwe jî wek kesê duyem ê vê kanonê destnîşan dike. Ev gotar li ser vê mijarê hûr dibe û cih dide awayên kanonkirina Hacî Qadirê Koyî. Ji ber vê gotar ji weşanên pêşî yêñ kurdî behsa wan kesan dike ku dikevin bin karîgerîya ramanêñ Hacî Qadirî û wî wek kesê kanonîk dişayesînin. Pişti vê cih dide wan boçûnêñ ronakbirêñ çeprew û neteweyî ku her yek ji alîyê xwe ve hewl didin li gor îdeolojîya xwe hizirêñ Hacî şirove bikin. Di xala sêyem da gotar bal dikêşe ser hin helbestvanêñ sedsalâ bîstî ku Hacî wek kesayetekî kanonîk şirove dikin û wî wek rêberê helbesta neteweyî nîşan didin.

Bêjeyêñ Sereke: Hacî Qadir, Kanon, Kanona Edebîyata Neteweyî, Helbest.

HACÎ QADIRÊ KOYÎ: THE FOUNDER AND SECOND PERSON OF THE KURDISH NATIONAL LITERARY CANON

ABSTRACT

The national literary canon is one of the points of connection of literature and politics that has been invented in the modern era to represent the cultural identity of a nation. For the first time in Kurdish literature, Haji Qadir Koyi laid the foundation of the national literary canon and he introduced Xani as the father of the Kurdish national literary canon and himself as the second person of this canon. This article focuses on this topic and describes canonizing of Haji Qadir Koyi as the second person of the Kurdish national literary canon. That is why the first Kurdish publications mention those who fall under the influence of Haji Qadir's ideas and describe him as a canonical person. It then mentions the views of leftist and nationalist intellectuals who each try to interpret Haji's thoughts according to their own ideology. In the third point the article draws attention to some twentieth century poets who describe Haji as a canonical figure and portray him as the leader of national poetry.

Keywords: Hacî Qadir, Canon, National Literary Canon, Poetry.

DESTPÊK

Kanon ji alîyê dîrokî ve ji bo wan rêzepirtûkan tê gotin ku ji bo dezgehê perwerdeyê tê hilbijartın (Bloom, 2014: 23). Lê bi demê ra ev ji bo qada edebî jî tê veguhesstin, lewra bi gotina Bloomî sînordarîya temenê mirovî û zêdebûna berhemên edebî weha dîkin ku hin kes ji nav vê geremolê berhemên taybetmend û resen hilbijérin û pêşkêşî raya giştî bikin (bnr: 2014: 32, 38). Jusdanis ji vê kiryarê ra “dîroka edebîyatê ya abîdekirî” dibêje ku pirtûkên dikevin nav vê rêzbendîyê serederîya pirtûkên pîroz bi wan ra tê kirin û weha tê bawerkirin ku di nav van wan da gelek raz hene û divê hertim bi şiroveyên nû ev raz û nîyaz bêñ keşifkirin (1998: 83).

Di serdema modern da bi hewldanê netewesazîyê ra manayeke taybetî li kanonê tê barkirin. Lewra her netewe hewl dide hebûna xwe bispêre serdemên kevintir û di nav iro û raborîyê da girêdaneke berdewam çê bike. Ji bo vê kanon derfetên baş pêşkêşî xwedîyên vê hizirê dike. Loma jî “kanon” û “netewe” dibin hevalbendê hev û bi vî awayî “kanona edebîyata neteweyî” di serdema modern da ji bo hebûn, nûnerî û berdewamîya neteweyekê tê pêkanîn ku xwe dispêre naverok, armanc û tesewira netewetîya modern. Bi vî awayî kanona edebîyata neteweyî yan jî bi gotineke din “kanona fermî ya edebîyatê” (bnr: Baki, 2013) dikeve bin xizmeta netewesazîya modern. Nexwe êdî ji bo daxilbûna nav kanonê “resenî” û “edebîtî” ya berheman têr nake û divê ev berhem bi hin amajeyên vesartî yan aşkera xizmeta pêkanîna nasnameya neteweyî yan jî armancê sîyasî yên demê jî bikin. Ji ber vê, berhemên ku di rêzbendîya vê kanonê da tê bicihkirin bi riwanghêñ sîyasî û neteweyî tê şirovekirin û li gor armancê niha yên neteweyê tê bikaranîn.

Ev rewşa nû bêguman pêkhênerên destnîşankirina kanonê jî diguhere ku bi gotina Murat Belgeyî êdî kanon ne tenê ji alîyê nivîskar, ronakbîr, mamosta û rojnameyan ve, belkî dezgeh û kesayetên sîyasî heta gel û civak jî dibin bikerên afirandin û destnîşankirina kanonê (2009: 85). Lê di nav neteweyên bêdewlet da ji ber nebûna dezgehê fermî yên çandî û perwerdeyî ev bar bi piranî dikeve ser milê ronakbîr, kesayetên sîyasî, helbestvan û nivîskarêñ neteweperwer ku di nav civata xwe da xwedî rolêñ giring û karîger in.

Di nav kurdan da jî em rastî heman dîyardeyê tê û Hacî Qadirê Koyî di nîvê duyem ê sedsala nozdehan da li Stenbolê dema bi encamêñ modernîteya Ewropayê û xebatêñ netewesazîyê ra rûbirû dimîne bi helbestêñ xwe yên naverok-nû hewl dide kurdan li hember van pêşhatêñ nû hişyar bike. Ji ber vê di ber mijarêñ serxwebûnxwazî, xwendina keç û kur'an, hînbûna zanistêñ nû (fen), hevgirtina navxweyî, nostaljîya dîrokî, xwe-cîyakirina ji neteweyêñ dewrûber û rêbertîya civakî ya ronakbîren modern ra, mijara ziman û edebîyata neteweyî jî dibe yek ji karêñ wî yên giring û bi vî awayî poetîkayeke nû ya edebî destnîşan dike û berpirsyarîyeke sîyasî û civakî dide ser milê edîbêñ hevçerx.

Li alîyê din Hacî bi du helbestêñ xwe hewla avakirina kanoneke edebî jî dide ku di yekî da “kurdîni-vîsîn”ê dike pîvana kanonê û di ya duyem da jî “hişmendîya nasnameya neteweyî” dike xala cîyaker a kanonê. Ji ber vê wek nûnerê neteweyeke bêdesthilat, ji bo nîşandana hebûna edebî ya neteweya xwe li hember neteweyêñ mezin ên desthilatdar, herwek di helbesta “Şehsevarî Belaxetî Kurdish”ê da jî tê dîtin (bnr: Alan, 2013: 61) di çarçoveya zarêñ cuda yên kurdîyê da navêñ hin helbestvanêñ sereke rêz dike û wan hemûyan wek xemxwarê kurdayetîyê nîşan dide. Di vê çarçoveyê da ji nav helbestvanêñ Baban navêñ Mistefa Kurdî, Nalî, Muhemedê Fîkrî, Rencûrî, Emîn Begê Dizeyî, Keyfi, Salim, Şêx Reza, Wefayî wek nimûne tîne, ji nav helbestvanêñ kurmancîya jorîn (ew dibêje helbestvanêñ Cizîrê) navêñ Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û Feqîyê Teyranî derdixe pêş, ji helbestvanêñ goran navêñ Mewlana Neqşebendî, Mewlewî, Mela Mistefayê Bêseranî, Mîrza Ye'qûb, Hesenê bavê Feqî Umerî tîne, ji helbestvanêñ zengeneyî jî behsa Muhammed Komâsî û Ehmed Derbendî dike û ji ber ku wan bi kurdîyê nivîsiye û xîreteke kurdane nîşan daye pesnê van helbestvanêñ navborî dide. Loma jî di dawîya helbesta xwe da di derbarê van kesan da weha dibêje: “Be fidayan dekem sed Îbnu Yemîn / Çunke derbestî xîretî kurdîn” (2707: 185-191).

Herçend ji ber bikaranîna zimanê kurdî û nîşandana xîreta kurdîtiyê pesnê helbestvanêñ navborî bide û wek sermîyanê neteweyî şanazî bi wan bike jî di nav vê mîrata edebî da cihekî taybetî dide *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî, wê wek berhema sereke ya kanona edebîyata neteweyî derdixe pêş û xwe û Xanî jî rîberên vê kanonê dide zanîn. Loma jî di helbesta xwe ya “Zemane...” yê da bi malika “Le kurdan xeyrî Hacî û Şêxî Xanî / Esasî nezmî kurdî danenawe” yê (2707: 99) nerasterast Xanî wek “bavê kanona edebîyata neteweyî” û

xwe jî wek dûajoyê wî destnîşan dike. Bêguman di vir da mebest ji “esasî nezmî kurdî”yê helbesta neteweyî ye, ne ku helbesta ku bi kurdîyê hatîye nivîsin. Lewra bi raya wî *Mem û Zîna Xanî* ji ber ku bûye berhemâ temsîlî ya nasnameya kurdî bi qasî gencîneya gewheran û kîsê diravan giranbuha ye û ji hemû berhemên din cîyawaztir e. Bi vê gotinê Hacî Qadir nîşan dide ku bi awayekî hişmendane berê xwe dide vê mijarê û dibe kesê yekem ê diyarkirina kanona edebîyata neteweyî di nav kurdan da. Lewra kesê ku cara pêşî “bavîtiya Xanî” bi rengekî neteweyî derdixe pêş ew e û hizira bavîtiya Xanî di çarçoveya neteweyî da ji alîyê wî ve tê behskirin.¹ Bi vî awayî Hacî wek nerîtikênê edebîyata kevin û avakarê edebîyata nû, dibe yek ji wan helbestvanan ku herwek Bloom ji Borgesî vediguheze pêşiyên xwe diafirînin (bnr: Tek, 2018: 68) û dîbin diyarkeren bavên xwe yên edebî. Ji ber vê jî di piranîya xebatên kurdî da ku wek qadêن diyarkirina kanona edebîyata neteweyî derdikevin pêş, Xanî wek bavê vê kanonê tê pejirandin (bnr: Ergün, 2018) û Hacî jî wek “Xanîyê duyem” yan “bavê duyem” (bi taybetî ji bo zarê soranî) tê binavkirin. Dîyar e ku Hacî Qadirê Koyî, Xanî wek bavê kanona neteweyî destnîşan bike jî di bin karîgerîya pêşhatên modern ên serdema xwe da kesê ku cara pêşî hişmendîya nasnameya neteweyî dike pîvana kanonê ew e. Loma jî Xanî “bav” be jî avakarê hizira bavbûna wî, Hacî bixwe ye û damezirîneriya wî jî çavkanîya xwe ji vê xalê werdigire.

Di vê rewşê da herçend Ehmedê Xanî di serdema modern da wek “bavê netewetîya kurdî” bê şirovekirin jî bi bawerîya me herwek Fîrdewsîyê farisî damezirînerê hişyarîya etnîk e û ji alîyê teorîk ve nabe ku em wî wek pêşengê netewetîya kurdî yan jî damezirînerê kanona neteweyî bipejirînin.² Lê Hacî di nîvê duyem ê sedsala nozdehan da li Stenbola paytexta dewleta Osmanî di zemîna netewetîya modern da dest bi nivîsîna helbesten xwe dike û hemû taybetmendîyen netewetîya modern di xwe da vedihewîne. Ji ber vê çendê, ew vekoleren ku di çarçoveya teorîya modernist da diyardeya netewetîye şirove dîkin û li dijî netewepeperwerîya Xanî derdikevin di vê mijarê da kok in ku Hacî Qadirê Koyî helbestvanekî netewepeperwer ê serdema modern e. Ji bo vê mirov dikare berê xwe bide bîr û boçûnên Cefer Elî (2013: 157), Bruinessen (2008: 153-154) û Vali (2005: 121) ku her yek ji alîyekî ve cext li ser pêşengîtî û cîyawazîya Hacî dîkin.

Bi rastî jî Hacî Qadirê Koyî di çarçoveya netewetîyeke romantîk da di helbesten xwe da li ser serbixweyî, hişmendîya zimanê kurdî, vejandina dîrok û qehremanen dîrokî, dijayedîya çîna şexan, hevregezîya civakî, giringîdana bi gelî, li hember pêşengê civata feodal pesindana edîban (ronakbîran), xurtkirina hesta neteweyî, pêşxistina hizira rasyonel, rexnegirtina li rîbaza perwerdeya medreseyen kevin, wekhevîya jîn û mîran di warê xwendinê da û li ser modelgirtina modernîya ewropayî radiweste (Ergün, 2014: 11-31) û di manaya heqîqî da bingeha netewetîyeke modern datîne. Loma jî bi ragihandina pêşengîtîya Xanî di çarçoveya poetîkayeke nû da mirov dikare bibêje ku Hacî bingeha kanona edebîyata neteweyî jî datîne û xwe û Xanî dike xwedîyê vê “esas” a nû. Ji ber vê di dirêjahîya sedsala bîstî da herwek helbesta wî ya “Zemane...”yê gelek peyrewen vê esasê derdikevin holê ku ji Ebdurehîm Rehmî, Pîremêrd, Kamran Bedirxan, Esîrî, Cegerxwîn, Bêkes, Qani’, Goran, Hejar û Hêminî heta Şîrko Bêkes, Letîf Hellmet û Abdulla Peşêwî dirêj dîbin.

Bi vê riwangehê em dê di vê gotarê da awayê kanonkirina Hacî Qadirê Koyî vekolin. Ji bo vê pêşî em dê behsa bîr û boçûnên wan şirovekaran bikin ku Hacî Qadirê Koyî wek pêşengê netewetîye yan jî Xanîyê duyem pînase dîkin, paşê em dê di nav ronakbîren çeprew û neteweyî da awayê şirovekirin û kanonkirina wî berbiçav bikin û herî dawî jî em dê cih bidin afirandina îmaja kanonîk a Hacî di helbesta kurdî da, da ku em bi zelalî bibînin çawa li ser bingeha wî xwendingeheke edebî çê dibe û xelekên nû yên kanona edebîyata neteweyî zêde dîbin.

1 Bêguman berî Hacî jî gelek helbestvanen kurd dikevin bin karîgerîya Xanî û di çarçoveya mesnewînûsîyê da pê ra dikevin nav peywendîyen navdeqîtîyê. Ayhan Tek di xebata xwe ya *Hamisiz Şair û Babasiz Metinê* da (Helbestvanê Bêparêzvan û Deqa Bêbav) Xanî bavê cureyê mesnewîya kurdî dide zanîn û karîgerîya wî ya li ser mesnewînûsên piştî wî destnîşan dike (bnr: Tek, 2018: 84-92). Lê kesê ku cara pêşî bi manayeke neteweyî *Mem û Zînê* şirove dike û wê dike çavkanîya edebîyata neteweyî Hacî Qadir e.

2 Di vir da pêwîst e em bal bikêşin ser cîyawazîya nasnameya etnîk û neteweyî ku bi bawerîya me ji bo “bavîtiya Xanî” û “damezirîneriya Hacî” dibe pîvanake cîyaker. Lewra ji etnîsizmê cudatir netewetî diyardeyeke pirhêl e û bi amraz û pêvajoyen modernîye ve girêdayî ye. Xebatên etno sembolist ên mîna Smithî nîşanî me didin ku nasnameyên etnîk berî netewetîya modern peyda dîbin ku dîroka wan vedigere hezar sala sîyem a berî zayîn (2002: 69). Lê netewetîya modern xwe bispêre nasnameyên etnîk jî di navbera tixübîn sîyasi û çandî da girêdaneke nû çê dike (Smith: 2002: 18) û herwek modernistên mîna Gellnerî jî amaje pê dîkin di çarçoveya çand û welatekî hevbes da rê li ber besdarîyen nû jî vedikin (2013: 78).

1. PÊNASEKIRINA HACÎ QADIRÊ KOYÎ WEK DAMEZIRÎNER Û KESÊ DUYEM Û KANONA EDEBÎYATA NETEWEYÎ

Şirovekirina Hacî Qadirê Koyî cara pêşî di rojnameya *Kurdistanê* da tê dîtin. Di sala 1898an da dema rojnameya *Kurdistanê* derdikeve Mîqdad Mîdhed Bedirxan hem nûçeya koça dawî ya Hacî dide hem jî wê helbesta wî ya navdar “Zemane...”yê diweşîne û dîyar dike ku: “Ev mirov di saxîya xwe da gelek xebitî, derheqa elimandina ilm û marîfetê da gelek beyt û eşarêñ kurmancî dinivîsî, rîdikir welatê xwe Sora” (*Kurdistan*, 1991: 135). Bi vî awayî Bedirxan nîşan dide ku Hacî di nebûna rojname û kovarêñ kurdî da bi rîya nameyan helbestêñ xwe di nav gelî da belav dikir û bi vî awayî taybetmendîyeke berhemên kanonîk bi cih dianî ku ew jî populerbûn û temsiliyet e. M. Salih Bedirxan di *Rojî Kurdê* da tevî helbestêñ Xanî helbestêñ Hacî jî şirove dike û di wê bawerîyê da ye ku her xaleke qesîdeyêñ wan jîyan dibexşînin kurdan û bi şîret û pendan dagirtî ne. Li gor wî divê her kurdek beytêñ wan ji ber bike û wek stranan bike wîrdê ser zimanen (2013: 192). Bi vê gotina xwe helbestêñ Xanî û Hacî wek hêzeke manewî ya neteweya kurd dide zanîn û hewl dide bi rîya van helbestan neteweya kurd rake ser pêyan.

Piştî mirina Hacî, ji her kesî zêdetir Xelîl Xeyalî hewl dide wî di rîzbendîya kanona edebîyata neteweyî da wek kesê duyem bi cih bike. Ji ber vê di kovar û rojnameyêñ kurdî yên pêşî yên Stenbolê da piranîya nivîsarêñ xwe li ser boçûnêñ Hacî ava dike û cih dide helbestêñ wî. Xeyalî ji bilî ku Hacî bi gotinêñ rîzgirtinê mezin dike³ di çareserkirina kêşeyêñ wê demê û arastekirina kurdan da jî xwe dispêre bîr û boçûnêñ wî. Loma piştî destnîşankirina her kîmasîya kurdan wek çareserî beytêñ Hacî bi bîr tîne ku ji hevgirtin navxweyî heta hişmendiya zimanî û pêwîstîya xwendewariyê gelek mijarêñ serdemâ modern li xwe digirin. Bo nimûne di nivîsara xwe ya “Ji Mezinêñ Kurdan ra ye”yê ya *Hetawî Kurdê* da di çarçoveya bêtifaqî û nezanîya kurdan û metirsîya ermenan da cih dide helbesteke wî ya dirêj (M...X., 1331: 21-22). Her di hejmara yekem a vê kovarê da di bin sernavê “Şa‘irî Baban û Soran” û “Hacî Ebdulqadir Qedese Sirel‘ali”yê da du helbestêñ wî diweşîne û dîyar dike ku pêwîst e li ser jîyannameya helbestvanêñ ku Hacî behsa wan kirîye xebat bêñ kirin da ku nav û nîşanêñ mezinêñ kurdan winda nebin (M...X., 1331: 26). Di hejmara duyem a *Hetawî Kurdê* da jî di nivîsara xwe ya “Derdê Kurdan Nizanim ji Çi ye”yê da di derheqê şîrîniya zimanê kurdî da dîsa bi rîzgirtineke mezin cih dide beytêñ wî (M..X., 1331: 27-30). Herwaha di hejmara sêyem da jî di bin sernavê “Ji Qesîdê Hacî Rehmetî Têne Zanîn Ku”yê da her li ser rîça wî behsa rola xirab a çîna şêxan dike û cih dide bîr û boçûnêñ wî yên li ser vê mijarê (M...X., 1331: 21-22).

Dîyar e, Xelîl Xeyalî dîwana Hacî dike serçavîya hizirêñ netewetîya kurdî û bi nivîsarêñ xwe yên berdewam wî li ser textê kanonê dide rûnişandin. Ji ber vê giringîpêdana Xeyalî bi Hacî, di kovara *Jînê* da Süleymanîyeli Tevfik (Pîremêrd) dîyar dike ku Xelîl Xeyalî berhemên Hacî Qadir “îhya dike” ku tekane şîngîrê kurdayetîyê ye (Tevfik, 1985: 365-366). Ev nîşanî me dide ku eger pêngava yekem a kanonkirina Hacî ji alîyê şexsê wî û ronakbîrêñ malbata Bedirxanîyan ve hatibe avêtin pêngava duyem ji alîyê Xeyalî ve hatîye avêtin û Xeyalî bûye beşdarekî giring di dîyarkirina kanona edebîyata neteweyî da. Jixwe Xeyalî di dema xwe da di nav kurdêñ Stenbolê da wek mamostayê kurdayetîyê dihat zanîn û bi hizirêñ xwe îlham dida gelek ciwanêñ wê serdemê (bnr: Malmîsanij, 2002: 68).

Wek rojnameya yekem a kurdî ya li Îraqê di çendîn hejmaren rojnameya *Têgeyîstinî Rastîyê* da her bi pesin behsa giringîya helbestêñ Hacî Qadirê Koyî tê kirin û helbestêñ wî yên neteweyî û nîştimanî têñ weşandin. Li gor rojnameyê, Hacî Qadir helbestvanekî bêwêne yê kurd e û gelek neteweperwer e, ji ber vê jî mîna helbestvanêñ din xwe bi zulf û xalêñ yarê mijûl nake û di helbestêñ xwe da behsa rewşa civakî ya qewmê kurd dike da ku ciwanêñ azad û neteweperwer ên kurd di paşeroja nêzîk da ji bo bilindîya qewmê xwe têbikoşin (1918: 24/3-4). Rojname di çend hejmaren xwe da berdewam behsa ciyawazîya helbestêñ Hacî Qadirî dike û her beyteke helbestêñ wî “ummana civatnasî û îslahê” dide zanîn. Li alîyê din helbestêñ Hacî wek çavkanîya hestêñ neteweyî û nîştimanî dide zanîn ku her kesê wan bixwîne nikare xwe ji bin karîgerîya van hestan rizgar bike (1918: 25/2). Loma jî weşandina helbestêñ wî wek xemilandina rûpelên *Têgeyîstinî Rastîyê* dide zanîn û heyranîya xwe li hember “asarı nefisey Hacî Qadir”î derdibire û dîyar dike

3 “Edîbê mazin ê me cenabê “Hacî”, “Xudanê bifezîl û kemal qedî û qîmeta kelamê Hacî dizane”, “Hacî we ‘alîcenabek e ku çavê zemanê emsalî nedîtiye”, “Eva şairê bilind payey me Hacî Qadir” (Modanî X., 2013: 156-159). “Hezretî Hacî Ebdulqadirê Koyî quddîse sirrehu es-samî” (Bila sira wî ya bilind pîroz bibe) (M. X., 2013: 225).

ku li ku derê çavêwan bi beyteke Hacî Qadir bikeve dê bi şanazî biweşînin (1918: 33/3-4).

Hevindê Sorî di hejmara çarem a *Hawarê* da piştî ku li ser jîyana Hacî Qadirî agahîyen giştî dide wî helbestvanê yekem dide zanîn ku helbestên neteweyî nivîsîne û karê hişyarkirina gelî girtîye ser xwe (1932: 7). Di heman hejmarê da di bin sernavê “Ey Kurdîne Wuşyar Bibin”ê da hel Besteke wî ya neteweyî tê weşandin ku bi risteya “Xakî Cizîr û Botan...”ê dest pê dike (Koyî: 1932: 5). Di heman kovarê da Celadet Bedirxan jî behsa Hacî dike û cara pêşî ew bi awayekî rasterast wî wek Xanîyê dujem bi nav dike. Navborî di nivîsara xwe ya “Klasîkên Me”yê da dîyar dike ku: “Hacî Qadirê Koyî Xanîyê didowan e. Ew jî weke Xanî bi derdê miletê xwe dişewitî. Şihir û qesîdeyên wî tev da li ser milet û welêt in”. Piştî vê tesbîtê li ser dîwana wî agahî dide û di dawîya van agahîyan da helbesta “Zemane...”yê ku di rojnameya *Kurdistanê* da jî hatibû weşandin, careke din diweşîne û dîyar dike ku: “Ezê iro şihreke Hacî e neçapbûyî belav bikim. Herwekî me got Hacî perestişkarê Xanî bû. Hacî li ser Memozîna bavê min a destnîvîs şihira jêrîn nivîsandîye” (Azîzan, 2012: 564). Bi vî awayî helbesta “Zemane...”yê dibe nîşaneyeke giring a kanona edebîyata neteweyî ku tê da Xanî wek bavê helbesta neteweyî tê destnîşankirin û Hacî jî wek damezirînerê wê derdikeve pêş.

Celadet Bedirxan di nivîsareke xwe ya *Roja Nûyê* da jî piştî navê Xanî navê Hacî hildide û dîyar dike ku Hacî peyama Xanî ya nivîsîna kitêbên kurdî bi hişmendîyeke modern şirove kirîye û dema gotîye: “Le dewrî ême roman û cerîde / Egerçî meqsed e zanînî baw e” baş zanîye ku ev armanc bi xwendina medreseyen berê naçe serî. Loma jî dibêje: “Belê Xanî digot ‘Bixwîne’, Koyî li gora wextê xwe, bi ser ve zêde dikir û digot: ‘Bi awayê nû bixwînîn’ pê dikeve mezinê kurdan súcdar dike ku berjewendîyen xwe di ser berjewendîyen miletî da girtine” (1943: 1).

Refiq Hîlmî di *Şî'r û Edebîyatî Kurdiyê* da di çarçoveya hizira neteweyî da bal dikêşe ser taybetmendîya kanonîk a Hacî û wî wek “bulbulî nîştimanperwerî kurd” bi nav dike ku di sedsala 19an da navûdengê wî belav bûye. Bi dîtina wî, evîna milet û nîştimanperwerîyê ji zarokîyê ve ketîye dilê Hacî, ji ber vê helbestên wî seranser li ser welat û miletî dizane. Hîlmî weha nîşan dide ku dilê Hacî bi hemaseta agirîn a netewerperwerîyê dagirtî bûye û ji vî alîyî ve rola Namik Kemalê helbestvanê welatperwer ê tirk dîtîye di nav kurdan da (Hîlmî, 2010: 87). Navborî li ser karîgerîya helbestên Hacî û rola wî ya kanonîk weha dibêje:

Tu gumana min nîne, ku ruhê mubarek ê Hacî li asmanê bilind agahdarê vê yekê ye ku iro helbestên wî mîna ayetên qudsî li ser qelem û zimanê kurdan carî ye. Eger bizane ew xorîn ku di dema wî da xezelên rengîn ên hevrîşmî ji ber dikirin, niha xezelên nayab û binirx ên Hacî ji ber dikin, dê ji xweşîya dil dev ji wî asmanê bilind berde, vegere dînyayê û bê nav me. Lê Hacî vê naxwaze! Tişte ku ew li benda wê ye li ku ye? Hêja dûr e, gelek dûr e (Hîlmî, 2010: 91).

Elaeddîn Seccadî jî di *Mêjûy Edebî Kurdiyâ* xwe da dema behsa Hacî dike wî wek “pêşengê karwanê helbestvanênen welatperwer, stérkeke geş a milet û bilbilekî xweşawazê qewmîyetê” dide zanîn di lalezara *Kurdistanê* da (1389: 334). Seccadî di çarçoveya hizir û şîretên Hacî yên di derbarê nîştimanperwerîyê da digihîje wê bawerîyê ku Hacî bi van hizir û xeyalîn xwe digihîje payeya helbestvanênen herî mezin ên nîştimanî yên Ewropayê (1389: 348) û bi van gotinan xweserî û cîyawazîya wî destnîşan dike.

Ji alîyê kesayeta kanonîk a Hacî ve yek ji hewldanênen herî manadar jî danîna peykereke (kotel) wî ye li Koyeyê. Piştî Peymana 11ê Adarê (1970) wek destkefteke neteweyî dema Korrî Zanyarî Kurd tê damezirandin wek reflekseke neteweyî ev dezgeh ji sala damezirandina xwe ve danîna peykerê Hacî dike bernamuya xwe û di hejmara xwe ya pêşî da jî piştî ku bal dikêşe ser payeya Hacî Qadir a di jîyana neteweyî û ronakbîrî da dîyar dike ku sala 1971ê dema li Koyeyê li ser navê Hacî ahengek hatîye lidarxistinê li ser navê Korrî Zanyarî Kurdê endamê kara yê Korrê Hejarî mîzgînî daye xelkê *Kurdistanê* ku bi hewldanênen Korrî Zanyarî Kurdê dê Wezareta Şarewanîyê peykerekî Hacî Qadir li Îtalyayê bide çêkirin û li meydaneke Koyeyê bê danîn (1973: 316). Herweha di heman kovarê da biryara çapkirina dîwana Hacî (1973: 530) û pirtûka Mesûd Mihemedî ya li ser jîyan û helbestên Hacî Qadirî jî tê dayîn (1973: 317). Di hejmara dujem a Korrî Zanyarî Kurdê jî tê dupatkirin ku dê Dîwana Hacî bi vekolîneke taybetî bê weşandin û nûçeya temamkirina peykera wî tê dayîn ku li Îtalyayê ji alîyê Xalîd Rehalî ve hatîye çêkirin. Piştî ku peyker tê, Korrî Zanyarî Kurd jê ra du lewhe dide çêkirin û çend beyt û sala jidayîkbûn û mirina wî li ser wan dide kolandin (1974: 861). Di encamê da sala 1973yan bi ahengeke mezin serokê Korrî Zanyarî Kurdê Îhsan Şêrzad li

Koyeyê perdeyê li ser peykera Hacî hildide, Mesûd Mihemed gotarekê pêşkêş dike û Hêmin jî helbestekê li ser kesayeta Hacî Qadirî dixwîne (1974: 862). Di nav gelek helbestvanê navdar da danîna peykerê Hacî ji alîyê akademîyeke zimanî ve ku pêşvebirin û yekxistina zimanî ji xwe ra kirîye armanc, karekî jirêzê nîne û ji danîna peykerekî zêdetir sembolîzasyoneke neteweyî ye ku ji hemû helbestvanê din bêhtir Hacî hêjayî vê hatîye dîtin.

Bêguman di seranserî sedsala bîstî da Hacî bi hizir, helwest û helbestên xwe dibe mijara gelek kovar, rojname, pirtûk û gotarêñ kurdî û bi şiroveyên cuda cuda wek Xanîyê duym yan jî pêşengê kurdayetîyê tê pejirandin û li ser vê rêçê, hêza wî ya kanonîk tê çespandin ku di besen jêrîn da jî em dê cih bidin hin hûrgulîyêñ din ên vê dîyardeyê.

2. ŞIROVEKIRIN Û KANONKIRINA HACÎ DI NAV RONAKBÎRÊN ÇEPREW Û NETEWEYÎ DA

Çarenûsa Hacî û Xanî ew çend li hev diçe ku şirove yan şâş-şiroveyên ku li ser wan hatine kirin jî gelek nêzî hev in. Piştî salêñ çili bi xurtbûna tevgera çînayetîyê çawa ku gotara neteweyî û çînî di nav ronakbîrêñ kurdan da tê têkelkirin, kesayetên neteweyî û edebî jî dibin qada pevgihîştina van her du gotaran. Ji ber vê herwek şâş-şirovekirina Ehmedê Xanî, Hacî Qadirê Koyî jî ji alîyê ronakbîrêñ çeprew ve wek kesayetekî dijberî çîna derebeg tê şirovekirin û bi têgeh û têgihiştineke çeprewane tê wênekirin. Di vê çarçoveyê da Mihemedê Mela Kerîm helbesta berî Hacî wek helbesta derebegitîyê dide zanîn ku xwe dispêre pesindana Xwedê, Pêxember, kesayetên mezin û mijarêñ dildarî, qehremanî û şerî lê helbesta Hacî dijberî qeyd û benden kevnisperestiyê wek helbesteke neteweyî dide zanîn (2008: 23). Ji ber vê Hacî wek pêşeng û dilsozekî mezin ê neteweya kurd li qelem dide ku ruhê xwe ji bo pêşvebirina kurd û Kurdistanê bext kirîye. Di vir da xala balkêş ew e ku Mela Kerîm hertim nakokîya Hacî û mirovîn kevnisperest derdixe pêş û hewl dide vê rewşê bi çemkîn çepitîyeke şoreşgîrane berçav bike (2008: 123). Tevî vê yekê dema hin boçûnêñ Hacî li îdeolojîya çeprew a Mela Kerîmî naguncin bi awayekî nazikane rexne lê digire û wek neteweyeke bindest û azadîxwaz dijayedîkirina ermenan ji alîyê Hacî ve tiştekî şâş dide zanîn. Herçend di çapa duym a xebata xwe da vê helwesta Hacî bi netewetîya burjuvayî ya wê demê ya ermenan ve girê bide û bixwaze vê rexneya xwe binermijîne jî (2008: 142) bi angajmana xwe ya îdeolojîk ve girêdayî dimîne.

Mesud Mihemed vê helwesta ronakbîrêñ çeprew şâş dibîne û dîyar dike ku gelek ronakbîrêñ nû yên kurd ku mebesta wî ronakbîrêñ çep in, Hacî wek “heykelekî şekirî” didin nîşandan ku xizmeta bîr û bawerîyen wan ên sîyasî bike. Li gor wî, ev kes Hacî ji dem û cihê wî dadibirin û wek kesayetekî serdemâ xwe şirove dîkin. Ji ber vê jî bi dîtina wî ev kes dixwazin Hacî wek “kurê reş û rûtekî” berçav bikin û wî li dijî çîna burjuva û derebegan nîşan bidin û “herwek binemayeke îdeolojîya çeprew bi yek çavî li hemû gelan temâşê bike” û tu cîyawazîyê nexe navbera gelên bindest (2010/1: 14). Bi vî awayî Mesud Mihemed li dijî vê yekê derdikeve ku Hacî ji hizirê netewetîyê bê dûrxistin û di çarçoveya kanona çînî da bê nirxandin. Li hember vê, pozîsyona Hacî di nav kanona edebîyata neteweyî da bihêz dike û dîyar dike ku ramanêñ Hacî di helbestên wî yên sade û rewan da bi awayekî aşkera xuya dibin û helbestên wî tu tewîlêñ ji mebestê dûr hilnagirin (2010/1: 17). Loma jî Hacî wek “ewlîyayekî netewetîya kurdî” derdixe lutkeyê ku ji hemû xweşî û lezetên dunyayê dest kêsaye û nûnertîya êş û hêvîyêñ miletê kurd kirîye. Mirov dikare van gotinêñ jêrîn ên Mesud Mihemedî di çarçoveya çêkirina kanona edebîyata neteweyî da bixwîne ku bi tebîrêñ tesewûñi dixwaze nîştimanperwerîya Hacî nîşanî me bide û wî ji “şâş-şirovekirin”êñ ronakbîrêñ çeprew rizgar bike.

Di wê cîhana fireh a tijî ji esbabêñ lezet û şehwetê da, Hacî Qadir bi qasî serê derzîyê hêviya xweşîyê û daxwaza cih û semyanê nekir. Ne ku nekarîye wan bi dest bixe, bi dilê xwe telaqê wan avêtiye û dest ji wan kişandîye û berê xwe daye eşqa miletî û sewdaya nîştimanperwerîyê. Mîna ku tu bêyî kaseya tijî şerab vala bikî û bi bizotan dagirî. Hacî Qadir jî bi daxwaza xwe ew wacib xistîye stûyê xwe, dilopa dawî ya hezkirina mal û koşknîşînî û hevrîşimpoşîyê di dilê xwe da çikandîye û di cihê wê da xetîreya heqperestî, welatparêzî û miletostîyê hilkirîye, xwe pê ron kirîye û ji bo wê şewitîye... Hacî Qadir ji yek peywendîyê zêdetir têkilîya wî bi dunyayê ra nebûye, ew jî peywendîya xewna welatperwerîyê ye, ji hemû alîyan ve hezkirina axa Kurdistanê, xelkê Kurdistanê, zimanê kurdî, dîroka kurdî, mafêñ kurdan û hemû tişten kurdan (2010/1: 38).

Herwekî dîyar e, Mihemed li hember “heykelê şekirî yê çeprewan” Hacîyekî “nûranî û pîroz” derdixe pêşberî me ku di dilê wî da ji bilî evîna neteweyê tu meyleke mirovî ya jirêzê nebûye, tenê ji bo kurdayetîyê jîyaye, loma jî wek ferîşteyekî kurdewarîyê ji hemû qehreman û ferîşteyên din balatir e û her kesê ku bixwaze li ser vî ewlîyayê neteweperwerîyê biaxive divê “bi destnimêj û tobe û istîxfarê dest bi karê xwe bike” û di serî da ronakbîr hemû milet xwe deyndarê wî bizanin. Ji ber vê, gilî li edîbêñ kurd dike ku bi qasî mijûlî Pol Ropsinî dîbin ew qas berê xwe nadin Hacî Qadirê Koyî û di gel ku pêwîstîya Ropsinî bi piştgirîya kurdan nîne jî bi gotina wî “ev kesên xwelîliser” parîya devê xwe derdixin û ji kesen mîna wî ra dikin xêr û sedeqe (Mihemed, 2010/1: 40). Bi vî awayî Mihemed bi awayekî aşkera li hember kanona çeprew hêz dide kanona neteweyî û Hacî Qadirê Koyî wek serkêşê vê kanonê bi pesn û mezinkirinê berçav dike.

Li hember vê, Ebdulsetar Tahîr Şerîf di çarçoveya netewetîya çeprew da li dijî boçûnêñ Mesud Mihemedî dî hewl dide Hacî bi çemkêñ netewetîya çeprew şirove bike. Ji ber vê di pirtûka xwe ya *Hacî Qadir Şa 'îri Şoreşgér û Pêşketinxwaz û Dîmukratî Netewey Kurdê* da wênekirina Hacî ya Mesud Mihemedî wek alîgirîya çîna derebeg û şewandina rastîya Hacî dide zanîn (1977: 37). Li gor wî du cure kurdayetî hene û kurdayetîya ku Mesud Mihemed nûnerîya wê dike xwe dispêre çîna axa, derebeg û hêzên emperyalîst. Loma jî vê kurdayetîye kurdayetîyeke sexte dide zanîn ku ji bilî wêrankirina mala xelkê tu sûdeke wê nîne. Li hember vê, kurdayetîya çeprewan pêşketinxwaz, rasteqîne û dirust dide zanîn (1977: 55). Ji ber vê jî Hacî di nav bereya kurdayetîya duyem da bi cih dike û herwek ji navê pirtûka wî jê tê famkirin Hacî bi sifetên netewetîya çeprew pêñase dike:

Hacî helbestvanekî neteweyî bûye, di qonaxa xwe da hevtayê wî kêm bûn. Li Kurdistanê yek ji wan kesan e ku bi tilîyan tê nîşandan. Li bajarê Koyeyê jî bê hevta bû. Herweha helbestvanekî şoreşgér bû (Şerîf, 1977: 94).

Marif Xeznedar jî di pêşgotina pirtûka navborî da piştgirî dide Ebdulsetar Tahîr Şerîfî û di çarçoveya netewetîya çeprew da Hacî şirove dike. Ji ber vê jî bi gotina wî li hember şiroveyen “paşverûyekî mîna Mesud Mihemedî” piştgirî dide hizirê “ronakbîrekî pêşketinxwaz, demokrat û sosyalistekî mîna Ebdulsetar Tahîr Şerîfî” (Xeznedar, 1977: 7-9). Xeznedar hizirê Mihemedî yên li dijî sosyalîzmê “jihevketî, yeknegirtî, kevneperek, rizî û bêhnpêketî” dide zanîn û têgihiştina wî di çarçoveya “xwîna pak, nijada pak, mala mezin, birayê mezin” da bi faşîzmê tawanbar dike (1977: 29). Ji ber vê, Hacî li hember derebegêñ ku nûnerêñ Sultanê Osmanî, Şahê Ecem, şêx û melayan in, wek nûnerê çîna hejar dide nasîn ku xwestîye xelkê kurd di wê serdemê da ji çewsandina wan hêzan rizgar bike (1977: 19). Xeznedar pesindana hin axa û malmezinan ji alîyê Hacî ve bi alîyê wan ê mirovî ve girê dide û wî wek kesekî şoreşgér û dijberî derebegan dide zanîn û ji bilî vê qayîl nabe ku Hacî bi tu tiştekî din bê tewsîfkirin.

Hacî gelek realist bûye, ji ber vê pirtir behsa başîya reş û rûtan kirîye, lewra ev xwedî başîyen gelek in û kêmtrî ji behsa hinek nûnerêñ çîna jorîn a kurdî kirîye lewra başîyen wan kêm in û zilamê baş jî di nav wan da kêm derdikevin... Hacî ji şoreşgér û dijminê derebegan pê ve tu tiştekî din nîne, eger pesnê hinek nûnerêñ wê çînê jî dabe ji ber alîyê wan ê mirovî ye, lewra Hacî bi gişî li dijî kiryarêñ çîna jorîn e. Dîyar e, di hemû zemanekî da ji çîna jorîn zilamêñ baş derketine û di nav çîna jêrîn da jî zilamêñ xirab hene lê ne ew başîya kêm, wan ji zulm û zora kevneperekî rizgar dike û ne jî ew xirabîya kêm, navê çîna jêrîn reş dike (Xeznedar, 1977: 22).

Reşîd Findî jî li ser şopa Mesud Mihemedî netewetîyê wek hizireke pîroz nîşan dide û dema behsa wer-girtina hizirê netewetîyê dike ji alîyê Hacî ve weha dibêje: “Hacî xweyî hesteka nazik bû û derûnekê pakij û bijûn hebû û axeka pakij bû, bo bîrûbawerîyêt neteweyî, her zûy ew şerbet vexwar û di hinav da çû û dara wî ya hozana neteweyî şîn bû û xemla xwe girt” (Findî, 1996: 68).

Ev gotara mîstîk a netewetîyê hem şêweyê çêkirina kanona neteweyî ya kurdî nîşanî me dide hem jî wê hest û hizirê berçav dike ku li pey dariştina vê kanonê ye, lewra neteweypeku ku di dirêjahîya sedsalekê da di nav serhildan û serkutkirinan da li pey armancêñ bilind ên neteweyî be gelek asayî ye ku di çêkirina kanonê da gotareke hestî derxe pêş da ku bi rîya edebîyata neteweyî û kesyetêñ vê edebîyatê berê girseyen gelî bidin qada têkoşîn û fedakarî û gelek caran jî mirinê.

3. AFIRANDINA ÎMAJA KANONÎK A HACÎ QADIRÊ KOYÎ DI HELBESTA KURDÎ DA

Di sedsala bîstî da piranîya helbestvanê netewepperwer ên kurd di bin karîgerîya xwendingeha neteweiyî ya Hacî Qadirê Koyî da dimînin, pê ra dikevin nav peywendîyê navdeqîtîyê û hêz didin kesayeta wî ya kanonîk. Ev peywendî bi awayekî berbiçav di çarçoveya teyîd û guncandin û bihêzkirina ramanê Hacî da derdikevin pêşîya me ku giringîdana zimanê kurdî, perwerdekirina gelî, hevgirtina neteweiyî, nostaljiyâ dîrokî, destkêsa helbesta eşqbazîyê, destnîşankirina dijminên derekî û navxweyî, rôbertîya helbestvanê netewepperwer û geşkirina berhemê xwemalî ji van mijaran in ku di bin sîbera wî da ji alîyê helbestvanê sedsala bîstî ve têr behskirin (bnr: Ergün, 2017). Lê ji nav vê lîsteya dirêj û mijarêne curbicur hinek kes rasterast û bi pesin behsa vê karîgerîyê dîkin. Ji van helbestvanan hinek jê rasterast Hacî wek pêşengê vê kanonê destnîşan dîkin lê hinek jî wek arasteya giştî wî wek Xanîyê dujem li qelem didin.

Esîrî di helbesteke xwe da navê Hacî di gel karakterên dîrokî yên mîna Selahedîn û Kerîm Xanî tîne û wî wek rizgarkerê kurdan dide zanîn: “Çawenorre gîyanyan bê şubhe bo rizgarî to / Şah Selaheddîn û Hacî, çend Kerîm Xanit heye” (Esîrî, 2006: 226). Ji bilî vê rola wî ya civakî û sîyasî wî wek serkirdeyê helbestvanê kurd jî dide zanîn û dibêje: “Ey Esîrî dem be dem şâ’îr le mîllet zîyad ebê / Hacî Ebdulqadirî Koyî welê serkirde ye” (Esîrî, 2006: 224). Esîrî bi van gotinan bi awayekî aşkera di kanona neteweiyî da pêşengtiyâ Hacî destnîşan dike û li ser rîbaza wî qadêن sîyasî û edebî têkelî hev dike û di her du qadan da jî pêşengtiyâ wî destnîşan dike.

Goran di helbesta “Yadî Bêkes”ê da dema rewşa nebaş a Kurdistanê bi bîr tîne wek rîzbendîya kanona neteweiyî pêşî dibêje: “di baxekî da Xanî hêstir dirijand” paşê jî cih dide Hacî û dibêje “dilê Hacî di agir da dîbirja” (Goran, 1389: 252) û Bêkesê helbestvan wek mîratgirê van her du pêşengan dide zanîn. Hejar jî herwekî Goranî piştî Xanî, Hacî wek mamostayê dujem ê Bêkesî dide zanîn ku alaya kurdayetîyê ji Xanî wergirtîye û “di şevêne reş û tarî û rîçen teng û zirav da” bê ku hest bi tirsê bike alaya kurdayetîyê gihadîye heta Bêkesî.

Hacî Koye le paş Xanî
Allakey xiste ser şanî
Be hengawî berz û behêz
Be dillî netirs û bê parêz
Be şewgarî reş û tarîk
Le şîw û rîy teng û barîk
Gwê nedaye ne’retey dêw
Sillî nekird le cind û xêw (Hejar, 1391: 94)

Hejar di helbesta xwe ya “Besarhatekem”ê de, ku ji bo bîranîna heftsalî ya Şoreşa Eylûlê nivîsiye, her du pêşengê kanonîk ên edebîyata kurdî (Xanî û Hacî) bi bîr tîne, bîr û bawerîyê wan wek serçavîya têkoşîna neteweiyî berçav dike û helbestvanê mîna Goran, Bêkes û Pîremêrdî jî wek peyrewêwan her du pêşengan dide zanîn.

Ziman û edebîyatekem
Gullî hîwa û awatekem
Pêwîst e bigesêtewê
Naşê le bîr biçêtewê
Debê allay Xanî hellken
Degell hewranî têkell kem
Şî’rî Hacî dexwênmewe
Tolle le zoll destênmewe
Goran û Bêkes yad ekem
Gîyanî Pîremêrd şad ekem (Hejar, 1391: 184)

Hejar di pêşgotina *Mem û Zînê* da dîyar dike ku dema sêzdeh çardeh salî bûye yekem car bi helbesten Hacî Qadirê Koyî hizira neteweppererîyê nasîye û berî ku Xanî binase Hacî wek “dahênerê kurdayetîyê, bijîşkê derdê komela kurdewarî” nasîye ku dest ji pesindana axa û pîran berdaye, berê xwe daye hezkirina gel û welatî û êrîşî xwînmijen kurdan kirîye. Hejar dîyar dike ku bi rîya helbesten Hacî, “Xanîyê mezin”

nasîye û piştî nasîna Xanî têgihîştîye ku Hacî şagirdekî dilsoz ê wî bûye (Hejar, 2010). Bi vî awayî bi çendin boneyan Hacî piştî Xanî wek mamostayê duyem ê hizira neteweyî destnîşan dike.

Belkî jî hêza kanonîk a Hacî herî baş di helbesta “Deskewtî Xebat”a Hêminî da tê nîşandan ku sala 1973yan di rêûresma danîna peykerê wî da dixwîne. Helbestvan ji ber ku Hacî wek remza rizgarîyê û qîbleya hemû kurdên pak dide zanîn axa bin pêyên wî jî hêjayî têdana ser û çavan dibîne. Bi dîtina wî, Hacî hemû jîyana xwe di rêya gelî da xerc kirîye, tevî ku gelek zehmetî dîtine jî tu carî xwe ji vê xizmetê dûr nexistîye, hertim bê tirs û şayîş li dijî bîyanîyan rawestaye û bûye remza rizgarîyê. Ji ber vê, bi raya wî, Hacî bi dengê xwe razayî hişyar, dijmin jî serberjîr kirine û berê xortê kurd daye şoreşa hevçerx. Helbestvan, bi gotina “le to fêr bûn xebat, qazî û melaman”ê jî bi awayekî amajeyî dîyar dike ku kesê ku xebata rizgarîya neteweyî fêrî Qazî Mihemed û Mela Mistefa Barzanî kirîye Hacî Qadirê Koyî bûye. Bi vî awayî xort, serkirde û hemû helbestvanê kurd wek şagirdê Hacî dide zanîn, “gotinê wî yên şîrîn ji bo kurdan pend û şîret û dijûnê wî jî binirx û baş” qebûl dike. Di dawîya helbesta xwe da ji Hacî ra dîyar dike ku ji serdema wî heta niha tu tiştekî ji bindestîya kurdan neguherîye lê li ser bingeha ku Hacî danîye êdî destjêberdana têkoşînê ne mumkîn e.

Debînin kotellî Hacî le kwê ye
Debînin kotellî şasiwarî Koyî
Ke rojêkî be pêyan lêre royî
Çilon bo surme nabê xakî şarêk
Ke Hacî pêy le ser danabê carêk
Ewe kotell nîye remzî necat e
Ewe deskewtî çend salley xebat e
Ew rûgey hemû kurdêkî pak e
Ew cêgay nîyaz e, pîr e, çak e
Bûtî sahebdillanî dillbeso ye
Ke ewro pêy denazê şarî Koye
Sillaw ey Hacî ey rolley zemane!
Le sayey towe her cêkî hemane
Hemû jînit le rîy gel da bext kird
Heta rîgay xebatit bo text kird
Gelêkit dî xerîbî û tall û siwêrî
Nebû satê le xizmet xoy bibwêrî
Be gjî bêgane û xomane da çûy
Le gjî dêwezme û dêwane ra çûy
Netirsay û nexeclay û nelerzî
Çi meşhûrî, çi rûsûr î, çi berz î
Hemû şagirdî ton şîrinkelaman
Le to fêr bûn xebat, qazî û melaman
Be dengî to xewall û raperrîw in
Le tîrsî to ye dujmin daperrîwin
Geray efkarî to ye ballî girtin
Kewa rolley gelit seryallî girtin
Be azayî, be zanayî, be wîrdî
Çekit da destî şorrişgêrî kurdî
Perrî dîwaneket genc e û xezêne
Wişey şîrînî to dujmintezen e
Hemû pend in qisey sûk û dizêwit
Wekû ballî perî pak e cinêwit
Be nirx e, taze ye, berz e, behêz e
Ewey fermût le barey pîyawî dêz e
“Eger kurdêk qisey babî nezanî
Muheqeq daykî hîz e û babî zanî”
Ke şî‘rî to bizawtî hestî hestan
Hemû sewdaserî serbestî hestan

Le Kurdistan gelêk şorriş berpa bûn
Kurrî kurdî be gij bêgane da çûn
Le mêt sall e derrêjin areq û xwên
Bellam daxî giranim hêste le kwê?
Ewêstaş derd e kurd nekira ‘îlacî
Ewêstaş kurdî koyle mawe Hacî!
Gelî kurdit nebû hêsta necatî
Be xwêni lawekan sûr e wilatî
Ewêstaş dujminî lasar û bedferr
Dekûjê kurdî bêtawan û laşerr
Ewêstaş her demanken tîrebaran
Denexşenin be xwên kollanî şaran
Ewêstaş pirrpirr in zîndan le lawan
Be xeyrî wey ke kurd in nîyane tawan
Ewêstaş gorrxerîb zor in wekû to
Ewêstaş bê nesîb zor in wekû to
Ewêstaş bêkes û dûreweten hen
Ewêstaş şâ‘îrî pîr û reben hen
Ewêstaş şî‘rî wîrdî kurdî dedrrin
Zimanî şâ‘îranî çakî debrrin
Bellam to dillnîya be pîrî zana!
Binaxêkî wehat bo kurdî dana
Îtir senger betallkirdin mehall e
Îtir kurd û bezîn, xewn û xeyall e (Hêmin, 2708: 255-258).

Letîf Helmet jî li ser vê şopê di helbesta xwe ya “Bo Hacî Qadirî Koyî”yê da Hacî wek pêşeng û rîberekî dide zanîn ku bi rîya wî hîn bûye çawa peyvê bike agir, helbestê bi evînê dagire û Kurdistanê bihebîne. Ji ber vê wek şagirdekî Hacî, xwe berpirsyar dizane ku zarokên kurdan hîn bike da ku helbestên wî ji ber bikin, bi tehma helbestên wî yên hingivîn bihesin û wan li ser hebikên genimên Qeracê û zinarê Hendirînê binivîsin. Li gor Helmetî di roja îro da bi milyonan kurd bi saya ramanê helbestên Hacî dijîn, zarokên Kurdistanê helbestên wî dikin stran û li ser dar û ber û xwendingehehên welatî dinivîsin.

Fêrit kirdim
Çon wişe bikem be agir
Çon pirr ewîn kem hellbestim
Çon dar û berd û awî
Kurdistanim biperistim

Minîş minallan fêr dekem
Çon şî‘rî to le ber ken
Çon tamî ken weku hengwîn
Çon şî‘rî to binûsnewe
Le ser hemû
Denke genimêkî Qerac û
Gişt taşe berdêkî Hendirîn...!
To dezanî êstake çendîn milyon kurd
Be bîrî naw şî‘rekanî to dejîn

To dezanî
Çendîn milyon minallî em Kurdistanê
Şî‘rit deken be goranî
Deynûsnewe: le ser dar û
Berd û dergay qutabxane..! (Hellmet, 2014: 366)

Abdula Peşêw xwe wek şagirdekî biçûk ê Hacî dibîne û wî jî wîjdana zindî ya Kurdistanê dide zanîn (Peşêw, 2006: 5). Ji ber vê di şirovekirina mijarêneteweyî da gelek caran amaje bi vî “zatê nûranî” dike

û hizirêñ wî wek çavkanîya çareserîyên kêşeyêñ roja îro derdixe pêş (Peşêw, 2001: 4). Her di vê çarçoveyê da di helbesta xwe ya “Duberekî”yê da Hacî wek kesayetekî pîroz û payebilind tîne ber çavan ku şevekê di xewa xwe da diçe ser gora Hacî, li ber çok datîne û di ber da diçe secdeye, halê perişan ê kurdan jê ra radigihîne û çareya rizgarîya ji vê rewşa xirab jî di hizirêñ wî da dibîne. Loma jî li ser zimanê Hacî dîyar dike ku di rewşeke weha da divê Hacî bê vejandin û di şûna wî da jî duberekîya nav hêzên sîyasî yên kurdî bê binaxkirin. Bi taybetî ìmaja çokdanîn û çûna secdeyê desthilata kanonîk a Hacî bi awayekî estetîk tîne ber çavan û nîşan dide ku di roja îro da jî ramanêñ Hacî di nav ronakbîr û civata kurdî da zindî û karîger in.

Şew le xewma,
Aramgey Hacîm dîtewe.
Çokim dada, sujdem bird boy.
Gutim: Hacî, perêşan ïn!
Serî kiz kird,
Destî dana ser dillî xoy.
Gutî: “Merd be, zîndûm kewe!”

Gutim: “Gewrem,
Min ‘Isa nîm,
Çon zindût kemewe, bêje?”
Gutî: “Lêre derim bêne,
Duberekî
Le şwênekey min binêje!” (Peşêw, 2014: 135-136)

Hemû ev mînak nîşan didin ku di seranserî sedsalâ bîstî da ji ber çaresernekirina kêşeyêñ neteweyî yên kurdan, raman û helbestêñ Hacî Qadirî yên ku di nîvê duyem ê sedsalâ nozdehan da hatibûn berhemânîn, di sedsalâ paşê da jî her zindî bimînin û xwendingeha wî ya neteweyî ji alîyê peyrewêñ wî ve her bê geşkirin. Di rewşeke weha da kanona neteweyî ya ku Hacî bingeha wê datîne û bavê wê destnîşan dike bi beşdarî û peyrewîya kesen nû her ku diçe xurt dibe. Bêguman ev beşdarêñ nû jî wek nîşaneyâ şopîneriya “bavê ican-kirî” (Xanî) û “bavê damezirîner” (Hacî) ìmaja wan a kanonîk xurt dikin û hizirêñ wan teyîd dikin.

ENCAM

Di encamê da mirov dikare bibêje kanona edebîyata neteweyî yek ji wan mijaran e ku peywendîyeke bîhêz di navbera edebîyat û netewetîyê da çê dike û pîvanên sîyasî û edebî têkelî hev dike. Ji ber vê, berhemên ku di çarçoveya kanona neteweyî da tên destnîşankirin ne tenê ji ber hêza xwe ya edebî, belkî jî zêdetir ji ber naverok û temsîliyeta xwe ya neteweyî qîmet werdigirin û dîbin berdevkê kesayeta manewî ya neteweyekê. Loma jî, berhemên kanonîk di dirêjahîya demê da hertim li gor pêwîstîyên sîyasî û civakî yên neteweyekê dubare tên şirovekirin û bê ku çarçoveya wan a dîrokî û nîyetên nivîskarên wan li ber çavan bêngirtin wek berhemên anonîm di her dem û gavê da ji nû ve tên afirandin. Ev jî dibe sedem ku manaya derekî ya berhemê gelek caran bikeve pêşîya manaya navekî û rîçika wê dîyar bike.

Herwek neteweyê din di edebîyata kurdî da jî di çarçoveya pêşketina hizirêneteweyî da kanoneke edebîyata neteweyî tê avakirin. Di nav kurdan da cara pêşî Hacî Qadirê Koyî hewla danîna vê kanonê dide û *Mem û Zîna Xanî* wek çavkanîya kanona neteweyî destnîşan dike. Hacî, piştî Xanî di vê kanonê da pâyeya kesê duyem dide xwe û di manaya heqîqî da dibe danerê kanona neteweyî. Bi vî awayî bi helbestên xwe yên neteweyî di manayeke modern da dibe nûnerê netewetîya kurdî û bi van hizirê xwe karîgerîyeke mezin li ser helbestvanê piştî xwe çê dike. Ji ber vê di dirêjahîya sedsala 20î da ronakbîr û helbestvanê neteweperwer ên kurd, Hacî wek Xanîyê duyem û rîberê helbesta neteweyî destnîşan dîkin û bi çendîn awayênciyawaz amaje bi hizir û naveroka helbestên wî dîkin. Bi vî awayî Hacî di edebîyata kurdî da wek kesayetekî kanonîk cihê xwe digire û dibe serçavîya îlhamê ji bo nifşen paşerojê.

ÇAVKANÎ

- Alan, R.. *Bendname*. İstanbul: Peywend, 2013.
- Baki, E.. *Uluslararası İnkılap ve Resmi Edebiyat Kanunu*. İstanbul: Libra Kitap, 2013.
- Bedirxan, M. S.. Berî Şîrê Qelem. *Rojî Kurd*. Koma Xebatên Kurdolojîyê (Amadekar) 189-194. İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2013.
- Bedir-Xan, C. A. Merhele. *Roja Nû*. 1,1-2, 1943.
- Belge, B. Türkiye'de Kanon, *Sanat ve Edebiyat Yazılıları*. 81-93. İstanbul: İletişim, 2009.
- Bloom, H. *Bati Kanonu Çağların Ekollerini ve Kitapları*. Çiğdem Pala Mull (Çev.). İstanbul: İthaki, 2014.
- Bruinessen, M.. Mem û Zîna Ehmedê Xanî û Rola Wê ya di Pêkhatina Hişyarbûna Neteweyî ya Kurd de. *Sempozyuma Ehmedê Xanî ya Navneteweyî* (149-159). Dîyarbekir: Gün Matbaacılık, 2008.
- Elî, C. *Nasyonalizm û Nasyonalizmî Kurdî*. Hewlêr: Endêşe bo Çap û Billawkirdnewe. 2013.
- Ergün, Z. Di Helbesta Kurdî da Destpêka Rêbaza Romantîzmê û Taybetmendiyê Romantîzma Hacî û Cegerxwîn. *Nûbihar Akademî*. 1, 11-31, 2014.
- Ergün, Z. *Nerît û Helbest*. İstanbul: Nûbihar, 2017.
- Ergün, Z. "Dahênanâ Mem û Zîna Xanî Wek Berhema Sereke ya Kanona Neteweyî ya Kurdî". *Nûbihar Akademî* 9 (2018), 31-57.
- Eriksen, T. H. *Etnisite ve Milliyetçilik*. E. Uşaklı, (Çev.). İstanbul: Avesta, 2002.
- Esîrî. *Dîwanî Esîrî*. Hewlêr: Dezgay Çap û Billawkirdnewey Aras, 2006.
- Findî, R. *Xanî û Haci*. Dihok: Çapxana Kulîja Şerî'ê, 1996.
- Gellner, E.. *Uluslar ve Ulusçuluk*. B. Ersanlı & G. Göksu Özdoğan (Çev.). İstanbul: Hil Yayın, 2013.
- Goran, E. *Dîwanî Goran*. Tîhran: Billawkirawey Panîz, 1389.
- Hejar. *Bo Kurdistan*. Sine: Pexşangay Hejar, 1391.
- Hellmet, L. *Dîwanî Letîf Hellmet*. Silêmanî: Nawendî Xezelnûs Bo Çap û Billawkirdnewe, 2014.
- Hêmin. *Dîwanî Hêmin Sercem Şî'rekanî Mamosta Hêmin*. Silêmanî: Pexşangay Azadî, 2708.
- Hilmî, R. *Şî'r û Edebîyatî Kurdî*. Hewlêr: Dezgay Çap û Billawkirdnewey Aras, 2010.
- Jusdanis, G. *Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür Millî Edebiyatın İcat Edilişi*. Çev. T. Birkan. İstanbul: Metis Yayıncılık, 1998.
- Korrî Zanyarî Kurd. "Le Beheşti Yadî Hacî Qadirî Koyiyewe Çend Hewallêkî Nwê". *Govari Korrî Zanyarî Kurd*. 1, 1, 316-321, 1973.
- Korrî Zanyarî Kurd. Çend Hewallêk. *Govari Korrî Zanyarî Kurd*. 1, 1, 526-537, 1973.
- Korrî Zanyarî Kurd. Korr û Hacî Qadirî Koyî. *Govari Korrî Zanyarî Kurd*. 2, 1, 859-871, 1974.
- Koyî, H. Q. *Dîwan*. S. H. Mîran & K. M. Şarezan (Lêkolînewe û Lêkdanewey). Sine: Şarekitêbî Mîdyâ, 2707.
- Koyî, H. Q. Ey Kurdîne Wuşyar Bibin. *Hawar*. 4, 5, 1932.
- Kurdistan. M. E. Bozarslan (Wer. ji Tîpêni Erebî bo Tîpêni Latîni). Uppsala: Weşanxana Deng, 1991.
- M...X. Ji Mezinên Kurdan ra ye. *Hetawî Kurd*. 1, 19-22, 1331.
- M...X. Şa'irî Baban û Soran, Hacî Ebdulqadir Qedese Sirel'alî. *Hetawî Kurd*. 1, 24-26, 1331.
- M..X. Derdê Kurdan Nizanim ji Ci ye. *Hetawî Kurd*. 2, 25-30, 1331.
- M.X. Ji Qesidê Hacî Rehmetî Têne Zanîn Ku. *Hetawî Kurd*. 3, 21-22, 1331.
- M.X. Serê Vê Jimara Sisîyan da "Bextbireşî û Mahrûmîyan Kurdan. *Rojî Kurd*, Koma Xebatên Kurdolojîyê (Amadekar) (225-226). İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2013.
- Malmîsanij. *İlk Legal Kürt Öğrenci Derneği Kürt Talabe-Hêvî Cemîyeti (1912-1922)*. İstanbul: Avesta, 2002.
- Mela Kerîm, M. *Du Babet Le Barey Bir û Şî'rî Hacî Qadirî Koyiyewe*. Hewlêr: Billawkirawey Aras, 2008.
- Mihemed, M. *Hacî Qadirê Koyî* (Beşî Yekem). Hewlêr: Dezgay Çap û Billawkirdnewey Aras, 2010.
- Modanî, X. Piroznawe. *Rojî Kurd*. Koma Xebatên Kurdolojîyê (Amadekar) (156-159). İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2013.
- Modanî, X. Ziman û Nezanîya Kurdan. *Rojî Kurd*. Koma Xebatên Kurdolojîyê (Amadekar) (160-162). İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2013.
- Peşêw, E. *Hespîm Hewre û Rikêfîm Çiya*. Kurdistan: Çapxaney Rojhelat, 2014.
- Peşêw, E. Çend Serincêkî Serpêy Derbarey Mêdyâ û Ziman, *Media*. 91, 3-4, 11, 2001.
- Peşêw, A. *Yekgirtû*. 574, 5, 2006.

- Seccadî, E. Mêjûy Edebî Kurdî. Senendec: Billawkirdnewey Kurdistan, 1389.
- Smith, A. D. *Uluslarm Etnik Kökeni*. S. Bayramoğlu & H. Kendir (Çev.). Ankara: Dost Kitabevi Yayınları, 2002.
- Süleymanîyeli Tevfik. *Jîn*. M. E. Bozarslan (Amadekar) (365-368). Uppsala: Weşanxaneya Deng, 1985.
- Sorî, H. Hacî Qadir Koyî. *Hayar*. 4, 7, 1932.
- Şerîf, E. T. *Hacî Qadir Sha 'îrî Şoresgér û Pêşkewtinxwaz û Dîmukratî Netewey Kurdish*. Bexda: Billawkirawey Rojî Kurdistan, 1977.
- Tek, A. *Hamisiz Şair Babasız Metin*. İstanbul: Nûbihar, 2018.
- Têgeyîştinî Rastî. Edebîyatî Kurdî. *Têgeyîştinî Rastî*. 24, 3-4, 1918.
- Têgeyîştinî Rastî. Edebîyatî Kurdî. *Têgeyîştinî Rastî*. 25, 2-3, 1918.
- Têgeyîştinî Rastî. Edebîyatî Kurdî. *Têgeyîştinî Rastî*. 33, 3-4, 1918.
- Xeznedar, M. Lêkolînewey Zanistî le Edeb da Arezû û Xeyal Nîye!. *Hacî Qadir Sha 'îrî Şoresgér û Pêşkewtinxwaz û Dîmukratî Netewey Kurdish* (7-31). Bexda: Billawkirawey Rojî Kurdistan, 1977.
- Vali, A. “Kürtlerin Soykütükleri: Kürt Tarih Yazımında Ulus ve Ulusal Kimliğin İnşası”. A. Vali (Amadekar) F. Adsay & Ü. Aydoğmuş & S. Kılıç (Wer.). *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri* (83-134). İstanbul: Avesta, 2005.

EXTENDED ABSTRACT

The national literary canon in the modern era is applied to the existence, representation and continuity of a nation and relies on the content, purpose and vision of the modern nation. Therefore, the products that are implemented in accordance with this canon are interpreted in terms of political and national contexts and used in accordance with the current goals of the nation. Of course in defining the national literary canon there are many factors and participants such as political power, educational institutions, media, intellectuals, writers, poets, critics, anthologists, literary histories and social groups and each of these has its own importance and uniqueness. Especially among stateless nations, most intellectuals, poets and writers have the task of defining the national literary canon and playing a leading role in this regard. Among the Kurds, we come across the same phenomenon, and as a poet Haji Qadir Koyi is the first person to try to establish a literary canon within the national consciousness. Therefore, he evaluates the Kurdish literary tradition from a national point of view and bases its use on the use of the Kurdish language and consciousness of identity. In order to praise many Kurdish poets for writing in Kurdish, he puts forward Ahmad Khani as the forerunner of the national literary canon in terms of Kurdish literary content and national consciousness, and demonstrates himself as the second person of this canon. Therefore, in most of the Kurdish works that emerge as fields of literary canon, on Haji's path, Xani is recognized as the father of the national literary canon and Haji is also referred to as the "Second Xani". Just like Haji Qadir Koyi puts forward Xani as the source of the national literary canon, after his death Haji is also interpreted in the same way and is placed as a canonical figure in the order of the national literary canon. Thus, throughout the twentieth century Haji became the subject of many Kurdish journals, newspapers, books and articles with his thoughts, attitudes and poems; and he is identified as the second Xani or the pioneer of Kurdishness with various interpretations and his canonical power is intensified in this way. In this context, the role of intellectuals such as Salih Bedirxan, Khalil Xeyalî, Celadet Bedirxan, Refiq Hilmi and poets such as Esîrî, Goran, Hejar, Hêmin, Letif Hellmet and Abdullah Peşêw is obvious. Haji's canonical power grows so much that Haji becomes a battleground between leftist and nationalist intellectuals and each of them wants to take advantage of his canonical power within the framework of his political thoughts and beliefs. Similarly, in the case of Kurdish nationalism, the name of Haji is mentioned in the first line. Because Haji Qadir Koyi focuses on the following issues in his poems in the context of a romantic nation: Independence, Kurdish language consciousness, revival of history and historical heroes, opposition to the sheikhs class, social homogeneity, giving importance to the people, praising the writers (intellectuals) against the leaders of the feudal society, strengthening national feeling, the development of a rational mind, a critique of the old madrasa education method, the equality of women and men in the field of education and seeing European modernity as role model and he lays the foundation of a modern nation in the true sense of the word. It is in this context he seeks to establish a national literary canon and for all these reasons also becomes a source of inspiration for poets after him. Thus, Haji's national themes are discussed by Kurdish nationalist poets throughout the 20th century, creating a national canon in his personality. In this context, this article focuses on the canonization of Haji Qadir Koyi and concludes that Haji Qadir Koyi is the founder of the Kurdish national literary canon in the modern era and has left his mark on the Kurdish intellectual consciousness of the twentieth century with his modern nationalist ideas.